1 Û sala panzdehemîn
ya xundikarîtiya Tîbaryos
Qeyser de Pilatos Pontî wali-
yê Cuhistanê, û Hêrodos se-
rekê çaryekê Celîlê, û brayê
wî Fîlîpos serekê çaryekê
welatê Îtorya û Traxonitsî, û
Lîsanyas serekê çaryekê erdê
Ebîleniyê,

2 û Hena û Qiyafa serda-
rên kahinan bûn; wî çaxî
xeberê Xwedê li beriyê ji
Yehyayê kurê Zekeriya re
hat.

3 Û ew hat hemî aliyên
Erdenê û imada tobê ji bona
efûtiya gunehan şîret dikir,

4 çawa ko li nav kitêba
xeberên Êşeyayê pêxember
hate nivîsîn : dengê wî yê ko
li nav beriyê gazî dike : Reya
Xudan hazir bikin, şivereyên
wî rast bikin.

١ و سالا پانزدهه‌مین یا
خوندکاریتیا طیباریۆس قیصر ده
پیلاطۆس پۆنطی والـی
جوهستانی ، و هیرۆدۆس سره‌کی
چاریه‌کی جلیلی ، و برایی وی
فیلیپۆس سره‌کی چاریه‌کی ولاطی
ایطۆریا و طراخۆنیتسی ، و
لیسانیاس سره‌کی چاریه‌کی عردی
أبیله‌نیي ،
٢ و حنا و قیافا سردارین
کاهنان بون ؛ وی چاخی خبری
خوه‌دی لبریی ژ یحیي یی کوری
زکریا ره هات .
٣ و أو هات همی آلیین أردنی ،
و عمادا تۆبی ژ بۆنا عفوتیا
گونهان شیرت دکر .
٤ چاوا کۆ لناڤ کتیبا خبرین
ئیشعیایی پیخمبر هاته نڤیسین :
دنگی وی یی کۆ لناڤ بریی
گازی دکه : ریا خودان حاضر
بکن، شیڤه‌رین وی راست بکن.